

Pirsgirêka Dengê Paşdaçekan

Xebatên standardkirinê ji bo yekkirina zimanê nivîskî û yekîtiya neteweyekê xebatên giring in. Ku pîvanên zimanê nivîskî neyên danîn, gelek pirsgirêk derdikevin meydana. Ev xebat pîralî û demdirêj in. Di nav van xebatan da rêbera rastnivîsînê, ferhenga rastnivîsînê, termînolojîyên qadên wekî zanist, huner, edebîyatê û hwd cihekî giring digirin. Ev kar, bi hewlêdanên şexsî heta cihekî bîr meşandin jî ji bo qebûl û başbûna wan divê bi awayekî komxebatî bîr çêkin. Di van komxebatan da ji bo zaravayên mîna kurdîya kurmancî divê mirov hesabê hemû parçeyên Kurdistanê bike. Di van karan da hin prensîbên ku heta îro derketine pêş bi vî awayî ne: çavkanî û jêderên zimanî, bikaranîna dîrokî (tradîsyon), berbelavî, hevgerî û hevahengîya zaravayan, çarçoveya rêzimanî û fonolojîk, hêsankarî û hwd.

Ku em di kurdîya kurmancî da bala xwe bidin xebatên standardkirinê, em dibînin ku kesên wekî Kreyenbroekî, Melayê Cizîrî wekî danerê destpêkê yê rastnivîsînê destnîşan kirîye.¹ Çend sed sal bi wan normên ku wî dîwana xwe pê nivîsiye, li medreseyan ders hatine dayîn û gelek berhemên klasîk hatine lêkirin. Di sedsala 20î da ji bo kurdîya kurmancî, bi derketina Hawarê ra pêvajoyeka din dest pê dike ku li vir a bîngehîn çêkirina alfabeyeka nû ya latînî û sepandina wê ye. Herçiqas bi giştî hevgirtinek tune be jî em dikarin bibêjin Hawar dibe bîngeha xebatên zimanî. Wê demê di nav kurdên Kafkasyayê da jî bi alfabeya kirîlî xebatên zimanî tên kirin. Ji ber ku li her cihê ku kurd lê jîyane bi awayên cuda xebat hatine kirin îro roj ji bo kurdîya kurmancî cotstandardî jî derketiye meydana.² Piştî xebata Celadet Elî Bedîrxanî, cara yekem bi awayekî komî Koma Kurmancî di sala 1987an da dest bi xebatên standardkirinê kir ku heta roja îro jî xebata wê komê berdewam e. Di sala 2015an da jî Weqfa Mezopotamyayê (ku ji bo avakirina zanîngeheka bi kurdî hat damezrandin) bi beşdarîya her çar parçeyên Kurdistanê û sazî û dezgehên zimanî, Komxebata Kurmancîyê ava kir û li gorî plana xwe ya zimanî dest bi xebatên standardkirinê kir û hin jî karên xwe didomîne. Piştî ku di sala 2019an da Rêbera Rastnivîsînê hat weşandin li ser hin mijarên rêzimanî nîqaş hatin kirin û hin nivîsên rexneyî hatin lêkirin. Di wan nivîsan da yek ji mijara ku rexne li ser hebûn, mijara dengê daçekan bû. Divê em dîyar bikin ku ev mijara li ser dengê daçekan ne nû ye û bi xebata Rêbera Rastnivîsînê dest pê nekirîye. Gelek zimannas û lêkolanan, berîya Rêbera Rastnivîsînê di nivîsên xwe da li gorî prensîpên standardkirinê yên ku me li jor nivîsîn,

¹ Kreyenbroek, P. G. r.56., (2005). On the Kurdish language, in The Kurds A Contemporary Overview. Taylor & Francis e-Library.

² Qesta me ji vê behdînî ye.

rexneyên xwe li pergala berê ya daçekan kirine. Wextê em li nivîsên heyî yên wan lêkoler û zimannasan dinêrin, em dibînin ku wekî palpişt prensîbên ku me li jor dîyar kirin derketine pêş.

Em dixwazin di vê nivîsa xwe da li ser mijara dengê daçekan bisekinin û tevî raya lêkoler û zimannasan, raya xwe ya li ser vê mijarê bi berfirehî dîyar bikin.

“Daçek, ew hêmanên rêzimanî ne ku bi tena serê xwe wateya wan nîne, lê wextê bi peyvên din ra tîn bikaranîn û qaliban çêdikin wateyên nû didêrin.” Mînak: *“Ew ji malê hat.”*, *“Bi min ev şaş e.”*, *“Min ji te ra negot.”*, *“Li bin darê çî dike?”*

Ji ber ku di vê nivîsê da mijara me, bazinedaçek in, em ê bi pênaseya wê dest pê bikin. *“Bazinedaçek du hêmanên daçekan in ku qalib in, bi hev ra tîn bikaranîn û peyv gelek caran dikevin nav wan. Hêmana serî pêşdaçek û ya dawîyê jî paşdaçek e.”* Mînak: *“Ez **bi** te **ra** tîm.”*, *“**Ji** vir **ve** xuya nake.”*, *“**Bi** alîyê min **da** hat.”*, *“**Di** malê **da** kî ma?”* Li vir *“**bi**”, “**ji**”, “**di**”* pêşdaçek in û *“**ra**”, “**ve**”, “**da**”* jî paşdaçek in.

Çi ye mijara dengê paşdaçekan? Paşdaçek di nav bazinedaçekan da hêmana dawî ye. Paşdaçekên kurmancî, di nivîsînê da bi du awayan tîn bikaranîn. Di awayê yekem da dengdêra *“a”* yê li ser wan e, di awayê diduyan da jî dengdêra *“e”* yê li ser wan e: *“bi...da/de, bi...ra/re, bi...va/ve, di...da/de, di...ra/re, ji...da/de, ji...ra/re, ji...va/ve.”*³ Mirov dikare bibêje ku li vir meseleya esil, guhertina dengdêrên *“a”* û *“e”* yê ye. Ev yek jî, ji mijareka rêzimanî bêhtir, ya *ferhenga rastnivîsînê* ye. Di vê nivîsa xwe da em ê bêhtir li ser paşdaçekên *“da”, “ra”* û *“de”, “re”* yê bisekinin. Ji agahiyên li jor jî xuya dike ku rêjeya bikaranîna paşdaçekên *“va-ve”* yê li gorî *“da”* û *“ra”* yê kêm e û di *“va”* yê da bere bere guhertinek çêbûye.

Li herêma Botanê (hin cih û bêhtir cihên çiyayî ne tê da) û li Mêrdînê (Bismil jî li ser, lê ne bi temamî), ev dengdêrên paşdaçekan wekî *“e”* û *“i”* yê tîn xebitandin. Ev deng, li wan deveran carna dikevin û dengnedêra van paşdaçekan bi peyvê ve tê nivîsîn. Mînak: *“Tu ji min **re** bîne.”*, *“Tu ji min **ri** bîne.”*, *“Tu ji mi’**r** bîne.”*; *“Tu di jor **de** were.”*, *“Tu di jor **di** were.”*, *“Tu di jor’**d** were.”*

Ji xeynî vê herêmê li Bakur, Başûr û Rojhilatê Kurdistanê (di zaravayên din da) bi piranî di paşdaçekên dengê *“a”* yê tîn bikaranîn. Li Rojavayê jî li Efrîn, Kobanî û Serêkanîyê ango li xeta Berfîratî û nêzî wê, *“da”* û *“ra”* tîn bikaranîn. Li Qamişlo û Amûdê jî di nav koçeran da formên *“da”* û *“ra”* yê çalak in. Em bi rehetî dikarin bibêjin ku li piranîya Kurdistanê dengê van paşdaçekan *“a”* ye û ev yek girêdayî xala *“berbelavî”* yê ye ku yek ji prensîbên sereke yê standarkirinê ye. Li gelek herêmên ku *“da”* û *“ra”* tîn bikaranîn, berovajîya *“de”* û *“re”* yê, dengê *“a”* yê tê parastin û nakeve.

³ Rêbera Rastnivîsînê awayê *“da”, “ra”* û *“ve”* yê wekî standard qebûl kirîye. Ji ber ku di *“va”* yê da guhertineka dîrokî çêbûye û di klasîkan da hatîye bikaranîn û di nav gelî da jî berbelav e awayê *“ve”* yê hatîye tercîhkirin.

Mînak: "Tu ji min **ra** bîne.", "Tu min **ra** bîne.", "Tu ji **ma** bîne." ; "Tu di jor **da** were.", "Tu jor **da** were."

Wextê em bala xwe didin van nimûneyan, em dibînin ku gelek peyvên ku îro ji bo rastnivîsînê me di wan da dengê "**a**"yê tercîh kirîye, li Botanê û li hin herêmên ber bi başûr, bûne "**e**". Li ser meseleyê "çawe, dîse, hoste, mele, paşe, vêce, zave..." û herweha dengê "**a**"yê li wan herêman û li hin herêmên din guherîye û ber bi "eyn"ê ve çûye, "mesî, çev, desî, belîf, becan..." Lê ji bo rastnivîsîna kurdîya kurmancî îro em bêhtir awayên wekî "hosta, mela, zava, vêca, paşa, çawa, dîsa..."yê tercîh dikin û herweha em dîsa ji bo rastnivîsê bêhtir awayên "masî, çav, dasî, balîf, bacan..."ê tercîh dikin. Meyla heyî ber bi "**a**"yê ve ye.

Li ser vê mijarê ji 2019an bi şûn da hinek nivîsên rexneyî hatin lêkirin. Di wan nivîsên rexneyî yên li ser dengê paşdaçekan da em rastî presîbên standardkirinê yên li jor qalkirî nehatin, di wan da bêhtir ev palpişt derdiket pêş: Digotin, "**Celadet Elî Bedirxanî ev daçek tercîh kirine, ev nod sal e ku awayê "de" û "re"yê tê bikaranîn û divê ev dewam bike.**" Ew kesên ku vî tiştî dibêjin, wekî ku Celadet Elî Bedirxanî li ser mijara daçekan nivîsîbe û raya xwe ya li ser van daçekan dîyar kiribe tev digerin. Li jêr em ê nîşan bidin ku Celadet Elî Bedirxanî li ser daçekan nenivîsîye û di Hawarê da destê xwe nedaye paşdaçekên "**da**" û "**ra**"yê. Ew kesên ku qala bikaranîna *nod salî* dikin bêhtir qala Bakurê Kurdistanê dikin. Li gorî gotina wan, mirov dibêje qey li vî parçeyê Kurdistanê dewleteka kurdan hatîye avakirin û ev 90 sal in pê perwedehî tê dayîn. Lê, rastî ne wisa ye. Jixwe ji sala 1946an û heta sala 1991ê li Bakurê Kurdistanê karên zimanî pir kêr hatine kirin û qedexeya li ser zimanî hebû. Pirtûk û kovarên ku di vê serdemê da hatine çapkirin pir kêr in. Di vê serdemê da cihê ku kurdî lê geş bû, perwerdehî pê hat dayîn û bi dehan berhem hatin çapkirin, Kafkasya bû ku li wê derê jî paşdaçekên "**da**" û "**ra**"yê hatin bikaranîn. Geşedana kurdîya kurmancî li Bakurê Kurdistanê di sala 2003an da dest pê kir. Dewletê, qedexeya li ser kurdî rakir û kursên zimanî hatin vekirin. Jixwe bi vekirina kursan û dersdayînê ra, nîqaşên pirsgerêkên zimanî jî dest pê kir. Rast e, bêhtir di van *sih* salên dawî da gelek nivîskar derketin (bi piranî ji Mêrdînê û derdora wê ne, vê jî tesîr li rewşê kirîye) û wan bêhtir "**de**" û "**re**" tercîh kirine, lê em qala pêvajoyeka *çend hezar salî* û qala *temama Kurdistanê û hemû zaravayan* dikin. Îro roj jî li gor agahiyên firotina pirtûkan, em bi rehetî dikarin bibêjin ku li Bakurê Kurdistanê ji %99ê kurdan bi xwendin û nivîsîna bi zimanê xwe nizanin û kurdî daxilî pergala perwerdeyê nebûye. Ku mesele perwerde be, em dikarin bibêjin ev nêzî pêncî sal e ku li Başûrê Kurdistanê perwerdehî tê dayîn û ev paşdaçek li wir bi awayê "**da**" û "**ra**"yê ne. Loma ev îdîaya ku dibêje "*Ev nod sal e wisa ye*" nabe palpişteka xurt. Eger di vê îdîayê da pîvan Hawar be, em dikarin bibêjin ku berî Hawarê tradîsyoneka çend sed sal dewam kirîye heye û gelek berhem pê hatine nivîsîn.

Celadet Elî Bedîrxan ji ber ku li ser rêzimanê sekinîye û nivîsin lê kirine, xebatên wî bûne bingeha xebatên rêzimanî. Ew di Hawarê da li ser hin mijarên rêzimanê dinivîse. Lê wî li ser hin beşên rêzimanê ramanên xwe dîyar nekirine. Yek ji mijarên ku wî li ser nenivîsiye, mijara daçekan e. Roger Lescot di pêşgotina pirtûka xwe û wî ya rêzimanê da qala vê yekê dike û weha dibêje, *“Evî karê hanê me bi hev ra dest pê kir, lê min bi tena serê xwe bi dawî kir, di vî karî da tiştê ket ser milê min ev bû; min beşa ku bi destûra wî hatibû nivîsîn (kêm zêde heta dawîya XX-an) cara dawî di ber çavan ra derbas kir û min dawîya beşa duyem [daçek jî tê da] û beşa sêyem bi xwe jî nû ve nivîsîn. Di vê berhemê da û di beşên din da yên ku birêz Celadetî nedîtine, kêmanî û qisûr hebin berpirsiyariya wan li ser milê min e.”*⁴ Li gorî vê agahîyê wextê em bala xwe didin pirtûka wan a rêzimanê, em dibînin ku beşa daçekan (XXII) bi temamî ji aliyê Roger Lescotî ve hatiye nivîsîn. Balkêş e, ew di mijara daçekan da vê agahîyê jî dide, *“Di gelek devokan da bi taybetî li Rojavayê ‘de’, ‘re’, ‘ve’ dibin ‘da’, ‘ra’, ‘va’.”*⁵ Jixwe em di nivîsên li ser rêzimanê yên di Hawarê da jî vê yekê dibînin. Arîf Zêrevan nivîsên Celadet Elî Bedîrxanî di bin sernavê *“Elfabêya kurdî Bingeheên gramera Kurdmancî”* da daye hev. Di naveroka wê pirtûkê da hin mijarên din û mijara *“daçekan”* tune ye. Arîf Zêrevan li ser vê yekê di pêşgotina wê pirtûkê da weha dibêje, *“Wekî ko xwendevan dê ferq bikin ‘Bingeheên gramera kurdmancî’ ne timam e, hemî beşên gramerê tê de nînin. Bo nimûne beşa lêkeran, ya hokeran, ya daçekan, ya hevoksazîyê, û hinek beşên din jî kêman in.”*⁶ Wextê em bala xwe didin Hawarê jî em dibînin ku Celadet Elî Bedîrxanî li ser daçekan nenivîsiye û destê xwe nedaye paşdaçekên *“da”* û *“ra”*yê. Ev ji bo vê mijarê, tiştêkî gelek giring e. Çînkû mijarin hene wî biryara xwe daye û ew rast kirine. Li gorî ku destê xwe nedaye daçekên *“da”* û *“ra”*yê û redakte nekirîye, xuya dibe ku li ser wê mijarê biryara xwe nedaye. Yek ji kesên ku heta hejmara dawî gelek nivîs lê kirine, Osman Sebrî ye. Di nivîsên wî da jî destwerdanek li ser paşdaçekên *“da”* û *“ra”*yê tune ye. Herweha di gelek nivîsên din da jî Celadet Elî Bedîrxanî midaxeleyî paşdaçekan nekirîye. Ji nivîseka Osman Sebrî mînak, *“Ew Çiyayê ko bi destê şîna Xwedê di bakurê welatê min da wek pandîgehekê hatiye daçikandin û ji ba û bager, berf û bilêk û mij û dûmanê vala namîne.”*⁷ Ev jî ji nivîseka Bedrî Cemîl Paşa ye, *“Di dinê da tu jîndar hene ko karibin bêserî bijin? Belê.. belê hene!... Hon karin bibêjin mêşek, kelmêşek bê serî nabe.”*⁸ Balkêş e mirov di hin nivîsên Celadet Elî Bedîrxanî da jî rastî paşdaçekên *“da”* û *“ra”*yê tê, wî her du cure di vê nimûneyê da bi hev ra bi kar anîne,

⁴ Bedir Xan, C. A., Lescot, R. r.10., (1997) Kürtçe Dilbilgisi, Stenbol, Weşanên Dozê.

⁵ Bedir Xan, C. A., Lescot, R. r.280., (1997) Kürtçe Dilbilgisi, Stenbol, Weşanên Dozê.

⁶ Bedir Xan C. A. r.8., (1998) *Elfabêya Kurdî Bingeheên Gramera Kurdmancî*, Stenbol, Weşanên Dozê.

⁷ Osman Sebrî, cildê duyem, hjm. 9., (1998) Çiyayê Agirî, Hawar, Nûdem.

⁸ Bedrî Cemîl Paşa, cildê duyem hjm. 32., (1998) Miletê Bêserî, Nûdem.

“Evdirehman di bin q[k]onên min da rabû bû... Tu ji Hawarê pesnê xwe bide û bêje: tirba Şêx Evdirehman di min da ye...”⁹

Agahîyên ku me li jor destnîşan kirin û ji nimûneyên Hawarê baş tê famkirin ku Celadet Elî Bedirxanî di mijara daçekan da raya xwe dîyar nekirîye. Lê ji ber ku di nivîsên xwe da (bi hejdeh navên cuda nivîsîye) daçekên xwe li gorî devoka herêma Botanê bi awayê “de”, “re” û “ve”yê bi kar anîne, ev ji hinekan ra bûye destûr.

Rojan Hazim jî di sala 2004an da li ser mijara dengê paş daçekan fikrên xwe dîyar dike û sekna Celadetî ya li hemberî van daçekan destnîşan dike û rast dibîne. Ew di nivîsa xwe ya bi navê *“Birek ji devoka pêşgotina pirtûka Devoka Hekarîya”*¹⁰ qala vê mijarê dike. Dibêje piraniya kurdan di axaftinê da forma “da” û “ra”yê bi kar tînin, edebîyata klasîk bi wî awayî ye û balê dikişîne ser helwesta Celadetî: *“Hal ew e ku, ew daçekên cêmik [twin] in. Di timamî tekstên edebîyata klasîk da ew formên „da” û „ra” hatine bi kar înan. Lê digel hindê jî, madem navçekeke lokal „de” û „re” dibêjin û Celadet Bedir Xan jî ew form bi kar înane, bila wekî daçekên cêmik di firehîya zaravayê Kirmancîya nivîskî da bêne bi kar înan. Belê ma kî guh dide van rastîyan! Statûkoperêsen zimanî teroreke diwar rakirine li ser van daçekên “da” û “ra” û di kîjan tekstan da bibînin hema yêkser tirpana xwe ya sansûrî dadîweşîninê û nahêlin ew daçek bêhnê werbigirin! (...) “Celadet Bedir Xanî bi xwe, gava ku tekst bo wî dihatin ku di Hawarê da bêne weşandin, dest li wan daçekên cêmik nedaye û cih daye van daçekên cêmik ku paralel bi kar bên....”*

Wekî ku Rojan Hazim jî dibêje kesên ku çav bi paşdaçekên devoka Botanê xistîye wan ew paşdaçekên xwe bêtî ku sedemên wê bipirsin terikandine û li ku çav bi “da” û “ra”yê ketine ew guhertine. Li ser meseleyê, Weşanên Lîsê, wextê bi dehan pirtûkên kurdên Kafkasyayê çap kirine, ew paşdaçek guhertine. Hin weşanxaneyan jî mîna ku şaş bin, destwerdana gelek berheman kirîye û daçekên wan guhertine.

Di sala 2008an da Mistefa Reşîd¹¹ jî li ser vê mijarê dinivîse. Ji nivîsa wî xuya dibe ku awayê “de”, “re” û “ve”yê neketîye serê wî, lê wî awayê bikaranîna daçekên Celadet Elî Bedirxanî wekî pêşnîyaz qebûl kirîye. Ew di nivîsa xwe da li meseleyê dielîqe û taloqî paşerojê dike. Di nivîsa xwe da qala sivikbûnê dike ku em nikarin wan tê xî nav prensîbên standardkirinê. Mistefa Reşîd jî li ser vê guhertinê weha dibêje, *“Lê belê rastiyeke din jî heye, ku piraniya gelê Kurd heya niha jî hên van paşdaçekan bi şeweyê bingehîn, şeweyê “a” bilêvdike. Di Kurmancîya Navîn de jî bi şeweyê “a”*

⁹ Celadet Alî Bedir-Xan, cildê yekem, hjm. 11., (1998) Nûdem.

¹⁰ R. Hazim, (2004), “Birek ji devoka pêşgotina pirtûka Devoka Hekarîya”.

<http://www.xweza.com/Peshgotina%20devoke%20Hekariya.htm> (serîlêdan, 05.02.2018)

¹¹ Reşîd M., (2008) Mijara Daçekê (I).

http://www.kurdistanabinxete.com/Rojnamen_iro/Rojnamen_Taybet/Kurdax/Kurdax-Rojname-3.pdf (serîlêdan, 02.05.2018)

tên bilêvkirin. Li Behdînan, li Hekarî û ji Beyazîd heya Meraş û Efrînê gişt bi awayê “a” dibêjin. Ji ber wilo jî, di gelek gotar û nivîsaran de em rastî şêweyê “a” dibin(...) Bi dîtina min –tevî ku kurdên herêma ez jê hatime şêweyê “a” bi kar tînin – divê em şêweyê sivik, şêweyê “e”, yê ku Mîr Celadet Bedixan pêşneyar kiriye, di zimanê standard de bi kar bînin. Heke rojekê ji rojan, dezgeheke fermî û nawendî ya zimanê kurdî biryarek girt û got, ku li gor prînsîpên demokratîyê, yan ji ber sedemeke zanistî divê em şêweyê “a” bi kar bînin, hîngê rewşeke din peyda dibe.”

Mistefa Reşîd bi xwe jî awayê “a”yê bi kar tîne û berê gotinê dide biryara dezgeheka fermî û navendî ku ew jî xwe dispêre prensîbên demokratîk û sedemên zanistî. Wekî ku di nivîsa wî da jî xuya dibe û ew ji xwe ra dike palpişt, yek jê awayê bikaranîna kurmancîya navîn e, a din jî ew e ku li gelek deverên ku kurd lê dijîn awayê “a”yê tê bikaranîn.

Em wextê bala xwe didin kovarên berîya Hawarê, Jîn û Rojî Kurdê; em dibînin ku li wir bi piranî paşdaçekên “da” û “ra”yê hatine bikaranîn. Taybetîyeka wan kovaran ew e ku ji gelek parçeyên Kurdistanê nivîs di wan da hene. Ku em nimûneyekê ji Rojî Kurdê bidin, *“Destê me da tenê cotkarî mayî ye, me gişa zanin ger îro ji wan kerba da azadbûn[a] me dîsa li ser cot e...”*.¹² Di kovara Jînê da jî bi piranî “da” û “ra” hatine bikaranîn. Nimûneyek ji hejmara pêşî weha ye, *“Îro, ku hemî millet ji xewa sibê rabûne, jibo jîna xwe dixebitin, melayêt her milletekî li ser minarêt xwe bangê sibê didin, hewayê sibê yê saf li ser hemî mexlûqat elametê jînê belav dike, em hêj di xew da nin!”*¹³

Ku em di çarçoveya bikaranîna dîrokî (tradîsyon) da li meseleyê binêrin, em ê bibînin ku di edebîyata klasîk da seranser paşdaçekên “da” û “ra”yê hatine bikaranîn. Hawar ji bo bikaranîna alfabeya latînî ya kurdî-kurmancî û xebatên rêzimanî giring e, lê wekî tradîsyon em mecbûr in xwe bigihînin çend sed sal berîya wê. Edebîyata me ya klasîk nêzî çend sed sal bi dehan berhem dan. Di medreseyan Kurdistanê da bi wê toreya ders hatin dayîn. Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî, Feqîyê Teyran, Sîyahpoş, Melayê Bateyî, Elîyê Teremaxî, Mela Mehmûdê Bazîdî û bi dehan kesan berhemên xwe bi forma “a”yê lê kirine. Ku em ji edebîyata klasîk çend mînakên bidin, Melayê Cizîrî di helbesteka xwe da dibêje, *“Nûra ji qudret lê du nûn jê ra dinalin erxenûn / Wer ayeta ‘îşqê bixûn xweşnusxeyek mestûr e dil.”*¹⁴ Dîsa Ehmedê Xanî di bendeka xwe da dibêje, *“Ez mame di hîkmeta Xwedê da / Kurmancî di dewleta dinê da / Aya bi çî wechî mane mehrûm? / Bîlcimle ji bo çî bûne*

¹² Rojî Kurd, (2013) hejmara yekem, nivîsa bi navê “Cotkarî”yê. Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.

¹³ Jîn, (1985) hejmara yekem, nivîsa bi navê “Xewa Me”. Amadekar: M. Emîn Bozarslan, Weşanên Dengê.

¹⁴ Gerdenîya Gewherî, r. 579., (2013) Melayê Cizîrî, Şerh: Mela Ehmedê Zivingî, Weşanên Avestayê.

*mehkûm?*¹⁵ Feqîyê Teyran di helbesta xwe ya “Ey Av û Av”ê da dibêje, “*Da ez bizanim vê surrê / Ji hindekê heta purrê / Ji me’naya vê gurgurrê / J’kê ra dikî vê ta’etê.*”¹⁶

Yek ji qadên ku kurd tê da zengîn in û xwedî gelek berhemên in, folklor û zargotin e. Ji ber ku dengê “a”yê di nav gelî da berbelav e, di piraniya keresteyên folklorê da (çi yên deşîfrekirî çi yên nedeşîfrekirî) dengê van paşdaçekan “a” ye. Koleksiyona A. Jaba yek ji çavkanîyên sereke ye di sedsala 19an da ji bo kurdîya kurmancî. Mela Mehmûdê Bazîdî hem di pirtûka xwe ya Rêzimanê¹⁷ da hem di xebatên xwe yên folklorîk da ji bo paşdaçekan dengê “a”yê bi kar anîye. Di sala 2008an da M. Emîn Bozaslanî li ser vê mijarê dinivîse. Ew jî di vê mijarê da piştî xwe dide sê hêmanên bingehîn: Berbelavî, edebîyata klasîk (tradîsyon), folklor û zargotin. Bozaslan jî edebîyata kurdî ya klasîk û ji folklorê kurdî gelek mînakên dide û ew di destpêka nivîsê da weha qala vê meseleyê dike, “*Wek ku tê zanin, ev her du paşbandikên me yanî “da” û “ra”, gelek caran ji aliyê hin nivîskar û rojnamevanên Kurd ve bi awayê “de” û “re” tên nivîsin (...) Lê belê ew awa ne li awayê peyvîna piraniya gelê Kurd tê, ne ji li awayê edebiyata Kurdi ya klasîk û folklorê Kurdi tê.*”

Di vê mijarê da yek ji prensîbên giring, berbelavî ye. Berbelavî, pêşzanînekê jî bi xwe ra tine û bi pedagojî û hînbûnê ra eleqedar e û bandora wê li ser hêsanîyê heye. Ji ber ku kurd îro bi piranî bi forma “da” û “ra”yê diaxivin, zarokên wan dê bi wê zanînekê dest bi dibistanan bikin. Îro roj li gelek bajarên Kurdistanê di van paşdaçekan da dengê “a”yê heye. Ku em zaravayên din jî li ber çavan bigirin, ku di wan da jî dengê paşdaçekan “a” ye, li Bakurê Kurdistanê li bajarên wekî, “Agirî, Bedlîs, Çewlîg, Cîlemêrg, Dêrsim, Dîlok, Dîyarbekir, Batman, Erdexan, Erzirom, Erzîngan, Îdir, Kilîs, Meletî, Meraş, Mûş, Qers, Riha, Semsûr, Sêwaz, Wan, Xarpêt”ê bi piranî di van paşdaçekan da deng “a” ye. Li Mêrdînê forma dengê “e” û “î”yê hene, li Şernex û Sêrtê jî li cihên çiyayî deng “a” ye ber bi deştê ve dibe “e”. Li Rojhilat û Başûrê Kurdistanê ev deng dîsa bi piranî “a” ye. Li Rojavayê Kurdistanê jî li bajarên wekî Serêkanîyê, Kobanî û Efrînê ku xeta Berfîratî ye, ev deng “a” ye. Li Qamişlo û Amûdê li deştê ev deng ber bi “e”yê ve ye, lê di nav koçerên wê herêmê da dengê “a”yê bi têra xwe heye. Herweha di nav milyon û nîv kurdên Xorasanê da jî ev paşdaçek bi dengê “a”yê ne. Tiştê xuya dike, îro roj li her çar parçeyên Kurdistanê ya herî berbelav di van paşdaçekan da dengê “a”yê ye.

Di hemû berhemên kurdên Kafkasyayê da ev paşdaçek bi awayê “da” û “ra”yê hatine bikaranîn. Kesên wekî, “Hecîyê Cîndî, Erebê Şemo, Emînê Evdal, Qanatê Kurdo, Emerîkê Serdar, Fêrîkê Îsiv, Casimê Celîl..” û bi dehan kesî berhemên xwe bi vê formê

¹⁵ Ehmedê Xanî, r. 56., (1968) Mem û Zîn, Amadekar: M. Emîn Bozaslan, Weşanên Gunê.

¹⁶ Feqîyê Teyran, r.114., (2009) Jîyan Berhem û Helbestên wî, M. Xalid Sadî, Weşanên Nûbiharê.

¹⁷ Mîkaîl Bilbil & Mistefa Oztirk, (2019), Rêzimana Mela Mehmûdê Bazîdîyî, Nîrxandin-Metin-Faksimîle: Weşanên Weqfa Mezopotamyayê.

nivîsîne. Wextê em berê xwe didin berhemên dînî yê êzdîyan, Mishefa Reş, Kitêba Cilwe, Qewl û Beytên êzdîyan (ku berîya sedsala 15an in) jî dîsa em li wir rastî dengê “a”yê tînin ku êzdîyên li hêla Şengalê hîn jî di axaftina xwe da bi piranî paşdaçekên “da” û “ra”yê bi kar tînin. Herweha li Başûrê Kurdistanê bi salan e ku perwerdehî heye û bi hezaran berhem hatine lêkirin. Ji xeynî herêma Botanê û Mêrdînê ku li wir formên “dî” û “rî”yê jî berbelav in, li piranîya Kurdistanê deng “a” ye.

Perwîz Cîhanî di sala 2012an da nivîseka bi navê *“Şaşîyên rênivîsa gorrbihîşt Celadet Bedirxanî”*¹⁸ lê dike û tê da mijara dengê paşdaçekan rexne dike. Perwîz Cîhanî qala berbelavîya li Kurdistanê û hebûna dengê “a”yê ya di zaravayên din da dike û weha dibêje, *“Dema ku mirov li ser zimanê kurdî lêkolînê dike, mirov dibîne, ku ji Îrewanê bigire ta ‘Efrînê, ji wir bigire ta Kirmanşah û Dêhloran û Mêhranê, ji wêdê bigre ta Şîraz û Xurasanê hemû kurmanc û Soran û Goran û Lek û Lor û bigire Fars jî van daçek û paşpirtikan bi dengdêra „A“ bi lêv dîkin. Tenê çend devokên dorûberên Cizîrê da ew rewşa rabêjtîna heye. Lê tiştêkî pirr girîngê dî heye, ew jî rewşa kewnetoreya kurdî ye. Eger em wê rênivîsa Celadetî bipejirînin, bi sedan û belkû bi hezaran kêş û qafîye û wate li helbest û kewnetoreya me ya nivîskî û heylo li toreya me ya zarkî da dê xewîşdar û birîndar bibin. Ji ‘Elîyê Herîrî bigire, ji Seyîdî Hewramî bigre ta Elîyê Berdeşanî û ta Cigerxûnî û bi sedan hozanên kurd „ DA, RA, VA“ bi kar birine.*

Wekî ku me li jor dîyar kiribû, yek ji prensîbên standardkirinê hevgerî û hevahengîya zaravayan e. Di hemû zaravayan da deng li ser “a”ê ye. Li vir divê em qala kirmanckî bikin. Di kirmanckî da “de” û “ra” hatine tercîkirin, lê divê em bizanin ku di kirmanckî da dengê paşdaçekan dirêj e û bêhtir li ser “a”yê ye, “de, o, rê, ro, wa, ya;a”.¹⁹ Di kirmanckî da li gorî “de”yê “ra” bêhtir fonksîyonel e û “de” tenê cihî nîşan dide; her wekî, *“Dî hişê aye de mendo.”*²⁰ Wekî din tu roleka wê tune ye. Peywirên paşdaçeka “ra”yê zêde ne, *“Ez to ra hez kena”*²¹ li vir şûna daçeka kurmanckî “ji”yê digire. *“Ez to ra vana”*²² li vir şûna bazinedaçeka “ji..ra”yê digire. *“To kurdî xo vîr ra kerda”*²³ li vir li şûna bazinedaçeka “ji...ve”yê hatîye bikaranîn. Jixwe di zaravayên din

¹⁸ Cîhanî P., (2012), Şaşîyên rênivîsa gorrbihîşt Celadet Bedirxanî.

http://www.amidakurd.net/ku/tekst/%C5%9Fa%C5%9F%C3%AEy%C3%AA_n%C3%AA_niv%C3%AEsa_gorrbih%C3%AE%C5%9Ft_celadet_bedirxan%C3%AE (serlêdan, 02.05.2018)

¹⁹ R. Lezgîn., r. 82., (2013) Gramera Kirdkî, Weşanên Roşnayê.

²⁰ hb. r. 85.

²¹ hb. r. 83.

²² hb. r. 83.

²³ hb. r. 83.

da ev deng bi piranî “a” ye. Kurdî û farisî, her du jî ji zimanê pehlewî hatine, di farisî da jî ev deng “a” ye, her wekî, *“Men to ra mîşunasem.”* û *“Men û ra dîdem.”*

Nivîskarên din bêhtir qala “va”yê nakin, ji ber ku di wê da guhertinek çêbûye, di klasîkan da bi piranî “ve” ye û di nav gelî da jî bikaranîna “ve”yê bi têra xwe heye. Lê Perwîz Cîhanî jî bo “va”yê jî heman tiştî dibêje ku me gotibû li gorî “ra” û “da”yê bikaranîna “va”yê di zimanî da kême.

Di vê mijarê da, li ser pîrsekê, Michael Chyt jî fikrên xwe dîyar dike.²⁴ Ew bi salan e ku li ser kurdî dixebite û wî di xebatên xwe da paşdaçekên “da” û “ra”yê tercîh kirine, di roportajeka xwe da piştî xwe dide, berbelavî, hevgirî û hevahengîya zaravayan, *sedemên fonolojîk* ku dibe sedema ketina dengê “e”yê û fikrên xwe weha dîyar dike, *“...Bi soranî “da” heye “de” tune ye. “Ra” heye “re” tune ye û herwisa “-ewe” heye. Ez ne şaş bim bi hewramî jî wisa ye. Vêca bo min rewş hêsan e, “da”, “ra” û “ve”. “Va” li Serhedan, li hin deveran dibêjin “va”. Pêşnîyara min ev e: “da”, “ra” û “ve”. Û tiştêkî din jî heye, gava ku ez ji mêrdînîyan dibihîzim ew dibêjin, “Ez ê ji te’r bêjim.” Yanî bîst salên din eger ev ziman bimîne ha! “Ji te re” dibe “ji ter”. Yanî ew “e”ya dawîyê wînda dibe. Lê eger standard “ji te ra” be, ew “ra” dimîne, ew wînda nabe. Ev sedemeke din e ji bo hîlbijartina “da” û “ra”yê di şûna “de” û “re”yê da. Lê dîsa her du nêzîkê hev in, lê eger mirov “di vî bajarî de” bibêjin em ê fêhm bikin. Yanî divê ku mirov li zaravayên din binêre. Gava ku mirov hewl dide çareserîyan bo pîrsîyarên wisa peyda bike, divê ku mirov jî çapa Kurdistanê ve lê binêre, ne tenê di gundê min da...”*

Di çarçoveya çavkanî û jêderên zimanî da li gorî agahîyên Beyhanî Şahîn dîyar dike, ev dengê “a”yê sedan sal e hatîye û tê bikaranîn, di zimanê avesta û pehlewî da jî di formên kevn ên van daçekan da dengê “a”yê heye, ew jî bo dengê van paşdaçekan vê agahîyê dide me, **“ra”**: *Ji forma Kurdiya Kevin *rād “jiber, loma” tê. Di Pehlevî da weke rāδ “jiber, di ber ... ra, jibo, têkildar” ee (Pehl. δ = d^h). Pehlevî: ēt rāδ “loma, jiber ...”, im čim rāδ “ku, heger, heke”. Mîna di Kurdî (Kurmancî û Zazakî) da hîna di Pehlevî da jî jibo tewanga “datîv” hatiye b’ kar hanîn. Di Farsiya Nuh da bi gelemperî jibo teşeya “akuzatîv” derdikeve pêş (weke Zazakî). Dîsan di Pehlevî da jî, kême be jî, jibo tewanga “akuzatîv” jî hatiye b’ kar hanîn. **“dî ... da”**: Dibêtane “dî” û “da” heman daçek inn. Lê hîlo xuya dibe ku di Kurmancî da hatiye dubare kirin. Ji Kurdiya Kevin *da tê. Di Avesta’yê da carekê weke -da hatiye b’ tomar kirin: Avestî: drujō vaēsmēnda azəmnaqm “(yên) berbi mala Drug va hajotinî” (Drug =*

²⁴ https://www.youtube.com/watch?v=ijLW6WgP7IM&t=437s&ab_channel=SZKmedya 2024. (serîlêdan, 07.05.2025)

Derewkar). Ev daçeka “da”, bi zanîna min, weke din di nav zmanên din yên Arî da xuya nabe.” Bêguman divêt meriv teşeya de/da ya di zmanê Tirkî da bêjenasiyî zelal bike, dibe ku di serdema Kurdiya Navîn da ji Kurdî derbazî zmanê Tirkî bûyî be.

“ve/va”: Avestî apa “jê ..., bê ..., cihêkirî ji ...” (~ Sanskrîti ápa): Avestî apa.gam- “jê çûn, terikandin” (av. gam- “çûn; hatin”, jê ji av. ā-ga-ta- “hatî”; Kurdî hatî < *hatīg < *hā.atīg < *hā-ya-tīg < Kurdiya Kevin *hā-ga-ta- ~ ligel teşeya *ā-gma-ta- → Farsiya Nuh āmadan “hatin”). Avestî apa.xsat̥ra- “ji desthilatê (dur) ...” (Kurd. şar, şaristan, Şarê/Şehr-î-ban < *xsat̥ra-bānu- “keyçe, qralîçe”). Avestî apa-yzara- (y = g^h) “ciyê av jê/cihê kirî”. Avestî apa-gaya- “mîrin m., ji jiyanê çûn” (gaya- “jiyan; mirov (-ê destpêkê)”), Avestî apa.yam- “tasfiye kirin” (yam- “girtin, pêgirtin”). Avestî apa-bar- “jê birin, jê (mehrum) kirin, jê girtin/standin” (bar- “birin”).

Hin rexneyên dîtir

Kesên ku rexneyan li awayê “da”, “ra” û “ve”yê dikin, dibêjin **“Madem hûn hildibêjirin, bila “da”, “ra”, “va” be ku ahengek di nav wan da hebe.”** Xuya ye ew kes bi vê gotina xwe, angî bi tercîhkirina “va”yê dikarin van paşdaçekan qebûl bikin, lê ziman, ne matematîk e û îstîsnayên wê hene. Di meseleya “ve”yê da wextê em berê xwe didin tradîsyonê, li berhemên klasîk dinêrîn li wir jî heman tişt heye. Herweha me di qala kirmanckî da behsa daçekên wan ên “de” û “ra”yê kiribûn, li wir jî cudahiyekek heye. Loma li gorî palpiştên “da” û “ra”yê ji bo “ve”yê tu nakokî dernakeve. Di çarçoveya rêzimanî da em dikarin bala xwe bidin pêşgirên karan ku têkilîya wan bi van paşdaçekan ra heye. “Da”, “ra” û “ve” wekî pêşgir tîr bikaranîn û gelek kar (lêker) ji wan hatine çêkirin. “Da-ketin, ra-ketin, ve-ketin”. Gelo em dikarin bibêjin li vir hevahengîyek tune ye û çima “ve” hatîye bikaranîn? Dîsa di gelek mijarên rêzimanî da îstîsna hene, “Guhertina veqetandekan a piştî gireyên nenasîyê, (-ekî, -eke, -eka) awayên karên (lêkerên) bêrist (çûn-ç, birin-b), têperîya (gerguhêzîya) karan (ketin-xistin, çûn-birin), guhertina gireya dema niha ya di hin lêkeran (karan) da (datînim, bi kar tînim) û hwd.” Ev nimûne bi me nîşan didin ku di zimanî da guhertin û îstîsna tîr qebûlkirin, bêtir ku zirarê bidin bingeha zimanî.

Yek ji tiştên ku bala me kişand, kesên ku li ser mijara dengê paşdaçekan nivîsîne, wan di nivîsên xwe da gelek palpiştên daçekên “da” û “ra”yê bi hev ra nedane. Angî ji bo “da” û “ra”yê çar pênc prensîbên standkirinê palpişt bin, wan qala yekê yan diduyan tenê kirîye. Li ser meseleyê tenê gotine, “Hûn dibêjin piranî, lê piranî têra her tiştî nake.” Yan jî tenê gotine “Rast e, di klasîkên me da bi vî awayî ye, lê ew klasîk in.” Lê wan kesan di heman nivîsa xwe da qala hevahengîya zaravayan, jêder û çavkanîyên zimanî, guhertinên fonolojîk û folklorê nekirîye. Di mijara berbelavîyê da jî wekî ku haya me ji Kurdistanê tune be û em di sedsela 19an

da bin gotine, *"Ma we pîvaye ku hûn dibêjin bi piranî?"* Îro bi rêya medyayê hûn dikarin xwe bi rehetî bigihînin vîdeoyên hemû deveran. Hûn li kurdên Xorasanê temaşe bikin, hûn ê pir bi rehetî daçekên wan ji hev derxin. Carna jî di wan nivîsan da agahiyên weha şaş hene, *"Devokên ku "de, re, ve"yê bi kar tînin ji yê "da, ra, va"yê bi kar tînin zêdetir in."* Ev agahî, şaş e û divê kesên zimannas, wan devokên welatê xwe nas kiribûna. Îro roj bi sedan pirtûkên folklorê û daneyên zimanî li ber destê me ne û em bi rehetî dikarin bibêjin, di van paşdaçekan da bi piranî dengê "a"yê tê bikaranîn.

Rexneyeka din a jî ev e ku hinek dibêjin, *"de" û "re" siviktir e.* Wekî ku me li jor destnîşan kir. Ev xal nakeve bin banê prensîbên standardkirinê. Kesên ku piştevanîya dengê "e"yê dikin gelek caran meseleyê bi sivikbûnê ve girê didin, lê di rastîyê da ew guhertina dengê "a" û "e"yê ye û bi sivikbûnê ra eleqeya wê tune ye. Sivikbûn bêhtir bi avêtina hin tîp û kîteyan yan jî li gorî bilêvkirina fonetîka kurdî ya giştî derdikeve meydana. Li ser meseleyê, hûn lêkera (kar) *"bisekine"* yê sivik bikin dikarin bi awayê *"bis"*ê jî bi kar binin, lê ev ji bo zimanê standard nabe pîvaneka baş.

Sivikbûn li gorî kê ye? Herêma ku *"de" û "re"* yê bi kar tîne û hînî wê bûye helbet dê bibêje, *"Ev bi min sivik e."* Lê herêmên ku hînî *"da" û "ra"* yê bûne, ew jî dê bibêjin, *"Ev ji me ra sivik tê."* Me hin rexne ji devê hin kesan bihîst ku digotin, *"Da û ra bi me ecêb tê û qet xweş nîne."* Ev kesên hanê gelek ji wan bi *"de" û "re" û "di" û "ri"* yê mezin bûbûn û wisa elimîbûn, carna jî digotin, *"Da û ra şaş in."* Ew kes divê bikarin, hesabê devokên din jî bikin û li temama Kurdistanê bifikirin.

Şiroveyên dîtir

Li ser vê mijarê hin gotinên wisa hene ku mirov dikare ji wan ra bibêje, *"şiroveyên zêdegavîyê"* ew tişt nabin rexne yan jî palpişt. Yanî wan kesan pir zor daye xwe ku ji bo *"da" û "ra"* yê tişteki nerênî bibêjin. Tiştên ku ew dibêjin dûrî aqilan in û nakevin nav çarçoveya rexneyê. Ew kes dibêjin *"Ku hûn "da" û "ra"yê tercîh bikin, dê deng li hev biqelibin û pirgirêk derkevin. Ji ber ku pêşgirên "da" û "ra"yê di lêkeran da wekî pêşgir tên bikaranîn ew dê di ber hev bikevin."* Ev daçek bi hezarên salan hatin û tên bikaranîn û neeliqîn û dê ji vir bi şûn da li hev bieliqîn? Di nimûneyên wan kesan da ev mînak hebûn, *"Ji min **ra rake**."* *"Di vir **da dake**."* Ango li gorî wan kesan dê li vir *"ra" û "ra"; "da" û "da"* tevlihevîyê çêbikin. Ku wisa be dê yek jî rabe bibêje, *"Ev tişt ji bo "ve" û "de"yê jî wisa ye, "Ji vir **ve vedibe**."* *"Bi min **re revî**."* Wekî din jî ew kes dibêjin, *"Ji ber ku "da" di hin devokan da tê maneya "dayik"ê û "ra" û "va" jî tên maneya "reh" û "eva han"ê dê alozî çêbibin.* Li gorî vê şiroveyê ku yek bixwaze ew jî dikare bibêje *"de" jî di hin devokan da hoker e ku hinek dibêjin "De di ber de here."* *Di hin devokan da jî "h" ketîye û hinek ji "reh"ê ra dibêjin "re".*

Dîsa di nivîseka rexneyî da qala dengdêra kurt a pêşdaçekên “dî”, “bî” “jî”yê jî dihat kirin û têkilîya vê dengdêrê, bi dengê kurt ê paşdaçekan (de, re, ve) ra, bi “e”yê ra dihat çêkirin ku çawa her du jî kurt in û di navbera wan da ahengek çêdibe. Ango, li gorî wî kesî wextê mirov dibêje, “ji..re”, “di...de” di navbera wan dengdêrên kurt da ahengek çêdibe ev jî ji guhî ra xweş tê. Li vir tiştê hatiye jibîrkin ev e: ev bazinedaçek bi tena serê xwe bi vî awayî nayên bikaranîn. Ev bazinedaçek gelek peyvên digirin nav xwe û gelek caran ahenga hevok an jî ravekan bi dengdêrên peyvên nav wan ra eleqedar e. Li ser meseleyê wextê em bibêjin, “Qaz bi qazan ra baz bi bazan ra” li vir aheng bi “a”yê çêdibe ne bi “î” û “e”yê. Loma wextê ev gotin bibe, “Qaz bi qazan re baz bi bazan re” aheng bi dengê wan daçekan çênabe, bivê nevê aheng li gorî peyvên navîn çêdibe. Ev şirove û rexneyên bi vî awayî, zêdegavî ne û tiştê li vê mijarê zêde nakin û wê şolî dikan.

Wekî encam em dikarin bibêjin ku mijara pisgirêka dengê daçekan, guhertina dengê “a” û “e”yê ye û têkildarî mijara rastnivîsînê ye. Çawa ku me di peyvên wekî “çawe, dîse, hoste, mele, paşe, vêce, zave...” û herweha “mesî, çev, desî, belîf, becan...”ê da ji bo rastnivîsîna xwe awayê “a”yê tercîh kiribe, ev mijar jî bi heman awayî ye. Celadet Elî Bedirxanî li ser daçekan nenivîsiye, beşa daçekan a di pirtûka wî û Roger Lescotî da ji alîyê Lescotî ve hatiye nivîsîn. Di Hawarê da Celadet Elî Bedirxanî di nivîsên xwe da awayê herêma Botanê nivîsiye, lê destê xwe nedaye “da” û “ra”yên nivîskarên din. Yek ji van kesan Osman Sebrî ye ku di gelek hejmaran da nivîsên wî hene. Meseleya standardkirinê piraî û demdirêj e û ev kar bêhtir bi komxebatan tîn çêkirin. Çavkanî û jêderên zimanî, bikaranîna dîrokî (tradîsyon), berbelavî, hevgerî û hevahengîya zaravayan, çarçoveya rêzimanî û fonolojîk, hêsankarî û hwd hin prensîbên sereke yên standardkirinê ne ku gelek ji wan palpiştîya paşdaçekên dengê “a”yê anga “da” û “ra”yê dikan. Îro roj li piranîya Kurdistanê û di zaravayên din da di van paşdaçekan da bêhtir dengê “a”yê tê bikaranîn. Wextê em berê xwe didin jêder û çavkanîyên zimanî, di zimanên cîran û yên kevn (avesta-pehlewî-farisî) da jî di van paşdaçekan da dengê “a”yê derdikeve pêşîya me. Berhemdarîya edebîyata me ya klasîk û berhemên me yên folklorê di mijara dengê paşdaçekan da li ser bingeha dengê “a”yê ne. Formên wekî “de”, “re”, “rî” û “dî”yê li wan herêman deforme bûne û dengdêrên wan ketine.

Têkilîya vê mijarê bi sivikkirinê ra tune ye. Berovajîya wê, meseleya berbelavîyê pêşzanînekê jî bi xwe ra tine û bi pedagojî û hînbûnê ra eleqedar e û bandora wê li ser hêsankarîyê heye. Herçiqas van salên dawî gelek berhem bi awayê “de” û “re”yê hatibin nivîsîn jî, bi vekirina kursên zimanî ra nîqaşên zimanî jî dest pê kirîye û ev pêvajoyeka normal e û em qala pêvajoyeka dîrokî dikan. Di mijarên standardkirinê da divê mirov li temama Kurdistanê bifikire û bîne bîra xwe ku bi salan li nav kurdên Kafkasya û Başûrê (nêzî 50 sal in) pergalek heye perwerdehî hatiye dayîn. Ku em li

gorî prensîbên standardkirinê li vê mijarê binêrin, em dê zûtir bigihîjin encameka baş û qebûlker.

Bahoz Baran

Çavkanî

- Amêdî S. B., *Rêzimana Kurdî, Kurmancîya Jorî û Jêrî ya Hevberkirî, Weşanên Dîwanê*, 2012.
- Baran B., *Rêzimana Kurmancî*, Stenbol, Weşanên Wardozê, 2018.
- Bedir Xan, C. A., Lescot, R. *Kürtçe Dilbilgisi*, Stenbol, Weşanên Dozê, 1997.
- Bedir Xan C. A., *Elfabêya Kurdî Bingehên Gramera Kurmancî*, Stenbol, Weşanên Dozê, 1998.
- Bilbil M. & Oztirk M., *Rêzimana Mela Mehmûdê Bazîdîyî, Nirxandin-Metin-Faksîmîle: Weşanên Weqfa Mezopotamyayê*, 2019.
- Bozarslan M. Emîn, *Baxçê Zimên, Weşanên Dengê*, 2008.
- Bozarslan M. Emîn, *Jîn, Weşanên Dengê, Kanûna Paşîn*, 1985.
- Cewerî F., Hawar, *II Cild, Weşanên Nûdemê*, 1998.
- Farqînî Z., *Ferhenga Kurdî-Tirkî. Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê*, 2022.
- Kreyenbroek, P. G. On the Kurdish language, in *The Kurds A Contemporary Overview*. Taylor & Francis e-Library, 2005.
- Komxebata Kurmancî, *Rêbera Rastnivîsînê, Weqfa Mezopotamyayê*, 2019.
- Lezgîn R., *Gramera Kirdkî, Weşanên Roşnayê*, 2013.
- M. Cizîrî, *Gerdenîya Gewherî, Şerh: Mela Ehmedê Zivingî, Weşanên Avestayê*, 2013.
- Rojî Kurd, *Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê*, 2013.
- Şahîn B., *Avesta, Destnivîsên Orîjîn: Yasna, SZK*, 2023.
- Teyran F., *Jîyan Berhem û Helbestên wî, M. Xalid Sadinî, Weşanên Nûbiharê*, 2009.
- Xanî E., *Mem û Zîn, Amadekar: M. Emîn Bozarsan, Weşanên Gunê*, 1968.

Çavkanîyên Dîjîtal

- Baran. B. (2017). *Cudatîyên Zimanê Devkî û Nivîskî Di çarçoveya Nivîsîna Folklorê Da*, <https://bahozbaran.wordpress.com/2019/05/18/cudatiyen-zimane-devki-u-niviski-di-carcoveya-nivisina-folklore-da/> (serîlêdan, 07.05.2025)
- Cîhanî P. (2012). *Şaşîyên rênivîsa gorrbihîşt Celadet Bedirxanî*, http://www.amidakurd.net/ku/tekst/%C5%9Fa%C5%9F%C3%AEy%C3%AA_n_r%C3%AA_niv%C3%AEsa_gorrbih%C3%AE%C5%9Ft_celadet_bedirxan%C3%AE (serîlêdan, 02.05.2018)

Hazim Rojan(2004). "Birek ji devoka pêşgotina pirtûka Devoka Hekarîya",
<http://www.xweza.com/Peshgotina%20devoke%20Hekariya.htm>
(serîlêdan, 05.02.2018)

Reşîd M. (2008). Mijara Daçekê (I)
http://www.kurdistanabinxete.com/Rojnamen_iro/Rojnamen_Taybet/Kurdax/Kurdax-Rojname-3.pdf
(serîlêdan, 02.05.2018)